

Dumahîk : Her dice.....

bêkarî, balavbûna nexweşiyên civakî li her cih û warî balav bûne, mixabin ku hin ji wan bi pîlan di civaka me de têne bicihkirin!!. Ji par û virde, ango piştî bikaranîna fermana Komarî nimre 49, xizaniya deverên Kurdî dubare bûye, nêzîkê (15-20)% ji xelkên me gund û bajarên xwe berdane û ber bi bajarên mezîna ve çûne, qûtê rojê peyda dikin û yê mane jî, di rewşeke pir aloz de dijîn, eger derfetek ji wan re peyda nebe, ewê jî xaka bav û bapîran berdin, gund û bajarên xwe kavil bihêlin!!..

Bi rastî, ev gunehkarîke mezîna û tewaneke ne mirovane ye dijî hebûna gelê me tê birêvebirina, li ti welatan, di ti zagonan û ti olan de rêdanek nayê dîtin ku miletek toşî şerê birçîkirinê bibe, piçûk ji nêza bimrin, zarok ji dibistanan derkevin û li kolanan karên xirab bikin!!.

Paşeroja gelê me yê Kurd bi taybetî û ya gelê Sûriyê bi gelemperî di metirsiyeye mezîna de ye, giringe hemî rewşenbîr, siyasetsvan û kesayetiyên welatperwer ên Sûriyê dest bidin hev, bi berpirsiyarî li gora karîna û zanîna xwe, gelê xwe hembêz bikin û wî ji vî şerê reş biparêzin, bi dil û can, ji bo bidestxistina berjewendiyên wî kar û xebateke îjdlî bikin, ji ber ku çîrok ne ya rebenê **Dilo** bi tenê ye, lê belê ew ya hizarên mîna wî ye!!.

30.08.2009 Z-2621K

Dumahîk : Pirsas Kurd....

û destpêkirina xwendin bi zimanê Kurdî di zanîngehên Turkiyê de û wd, hin gavên baş û bicî ji bo xurtbûna nîve demokrasiya Turkiyê û encama wan hewl û bizavan bû bîngeha destpêkirina pêvajoyekî nû ku di vî mehê de kete rojevê, gellek helwêst û daxuyanîyên ku çaverê nedihat kirin zû bîn cîbicîkirin, derketin holê.

Giringiya vî pêvajoya nû di wê yekê de ye

dawiyê bi proseya bive û qedexebûna baskirin li ser Doza Kurd û bînpêkirina mafê mirovan û mîlîtarîzekirin û bêpariya dever û bajarên Kurdistana Bakur û pîrsgirêkên wan hatiye û tê û ew tilisma dîroka hemdem a Turkiyê hatiye şikandin û dîwarê înkarkirina dehan salî a wê pîrsa rewya ya welatê Turkiyê ji holê rabû. Wê pêvajoya nû pêwîstî bi cidîyet û kar û mekanîzm û projeyên piratîkî û ron û herwiha domandina gotûbêj û hevdîtinan û çareseriyên demokratîk û aştiyane û siyasî heye.

Ligel wê yekê ku Turkiyê Konvansiyona Mafê Mirovan ya Ewropayê û çendîn peymannameyên din ên navnetewî îmza kiriye, lê hê wî welatî xalên Konvansiyona Ewropî a Parastina Mafê Kêmaniyan nepejirandiye û di wê derbarê de berdewam ji ber bînpêkirina mafê mirovan, bi taybet çaresernekirina pîrsa neteweyî a Kurdan di Turkiyê de rûbirûyê rexneyên tund bûye. Hewl û pêngavên vî dawiyê ji bo çareserkirina Pîrsa Kurd li Turkiyê ji rêya aşî, gotûbêj û siyasîyane ve dibe sedema cihgirbûna demokrasiya rasteqîn li Turkiyê û alîkariyek baş bo pêvajoya endambûna wî welatî di YE'ê û wergirtina Turkiyê wek endam di wê yekîtiya bihêz û xurt a cîhanê de ku ji bo Turkiyê pîr giring e.

Çareserkirina Pîrsa Kurd li Turkiyê pêwîstî bi qebûlkirina rastiya hebûna wê doza rewya û herwiha pêngavên cidî û piratîkî û çareseriyên bîngehîna heye û niha ji qonaxa gotin û dirûşman derbas bûye



Tîbên : Ev gotar ji kovara AGIRÎ, Hjmar 117 hatiye girtin